

nuh jê re pêça.

- Ez dixwazim fêm bikim çima... Girî kete gewriya wî, giriyê mêran pir giran e û nemaze yên wekî Memo, vê yekê jî hêşt ku pîrek ji odê derkevin.

Bi rê ve, û berî ku bigihên odeya jinan, li pêşiya axurê çêlekan S. Mistê ji ser hişê xwe dere, dikeve bin bas-kên dêw û pîrhebokan; her hinek wê bi aliyekî ve rakêş dikin û ji dûr ve dengê keça xwe dibîse, bang û hawara xwe dike wê, lê zendine pola wê ber bi odê ve dikşînin. Piştî ku wê dixînin nav nivînan, Sînem hest dibe ku, hêdî hêdî, hişê wê vedigere û ramanên xwe komî ser hevdu dike û ew roj, bi hemû bûyerên xwe, di pêş çavên wê re diherike.

Sibeyeke payîzê bû, piştî qehwa sibê û verêkirina mêr, wê jî rahişt fîncanan û deng li lawkê dêmariya xwe ya biçûk dike ku here cem Esê.

- Jê re bêje xaltiya min te dixwaze.

Berî lawik ji gedûkê derkeve, Sînem dinêre ku diya wî bi destan digre û şeqamekê lê dide.

- Min ne goti bû te ku ji cem birayê xwe meliv. Bi gotinê re lêwik têvedide hundir odê û bi çavekî tijî tinaz li Sînemê dinêre.

Evê yekê hêşt hêsir ji çavên Sînemê bibarin. Ev deh sal in wê mêr kirî, lê hîne bê zaro bû, û her ku seriyê zarokekî bidîta hêsir ji çavan dibarî, mêrê wê her tim

dilê wê xweş dikir û digotê: "Dê helbet rojekê Xwedê bi riwê me ve jî binêre". Piştî çar salên pêşî borîn, xuya bû ku wî jî hêviya xwe ji dayîna Xwedê birî bû, û di şeş salan de, çar jinên din, tîne ser Sînemê û yekê jî berdide.

Sînem, di nivê odê de rûniştî bû û, hûrik hûrik, lê ji cergeke bi şewat, hêsir dibarandin, haje xwe û hatina H. Reşo ya hundir tune bû.

- Xwedê xêrke, xanim, tu çima digrî. Sînem hinekî bêdeng dimîne, çavên xwe ji hêsrên ziwa dike û bi riwekî nîvrast - nîvken dibêje:

- Ez zarokekî dixwazim. Pirs û xwasteka Sînemê hêşt ku devê Hemik bi du bostan ji hevdu biçê.

- Min fêhm ne kir. Zaro... qey tê wî bişînî cihekî. Eger ev e.. ez karim bi wî karî rabim.

- Na.. ne ew e. Ez zarokekî dixwazim ku ji min re bêje dayê. Weke hemû pîrekan, ez dixwazim bihna zaroyan ji dawa min jî bê.

- Bes ev yeka ne ji min tê xwastin. Hemik hinekî li ber dimîne, lê di dawiyê de dudiliya xwe dibire û bi hêviyê eke bilind dibêje: "Eva han li mêrê te dimîne û di dû re li dayîna Xwedê". Bi xwêdan û çavsorî, gotina xwe bi dawî tîne.

- Dûr meçe Hemo.. mebest ne ew e. Lê di cih de li gotinê vedigere û dibêje: "Eger ez rast xanima te me û tu

bixwazî ji min re biçespînî ku tu ji min hez dikî -di vê derê de, Sînem birûhan dihejîne û carekê didwan çavan dadimrîne. Wê xwast, Hemik di bin baskên evîneke derewîn ke- tiwê zarokê ji min re bafirînî.

Hemik kir ku xwe bavêje hembêzê. Sînemê jî fêhm kir ku gotinên wê cihekî bilind di dilê wî de girtin, lewre, di cih de, çend bazinên zêrî ji destên xwe şimitandin û danîn pêş wî:

- Rahêje wan, ev xelata te ye û eger tu hêviya min bi cih bînî, wê hîngê dilê te di çî re hebe, tiwê bi dest xînî. Carekê bi dizî li riwê Hemik dinêre, dibîne ku nêrîtiyê ew kûr kirî û ziman bi bostekê dirêj bûye. Guhê xwe bide min, divê çêrok ji devê te dernekeve. Nuha tiwê herî û pîrka Fat ji min re bînî. Bê erê-na xizmetkarê mala M. Keleş radibe ser xwe û dev dide mala pîrka Fat.

Bi rê ve H. Reşo bi rewşa xwe û xatûnê dirame; "ev çawa zaroyekî dixwaze û ji kû. Ma kî dîn bûye ku zaroyê xwe bifroşe". Dîtina ewqas zêr û bi ser de jî, bi-destxistina hêviya di dil de jî, dê bihişta Hemik zaroyekî xwe bidize.

Pir naçe, pîrka Fat digel H. Reşo dikevin hundir. Sînemê jî di wê navberê de karên xwe yên biçûk bi dawî anî bûn û çaydanê çayê li benda wan bû.

- Xwedê xêrke, xatûn, te vê sibeyê şandiye dû min.

Pîrka Fat dipirse.

- Tu ya miraza yî, dayika Fat. Ez dibêjim Xwedê bi riwê me ve neriye û... Berî ew gotina xwe bêje li Hemik dinêre û jê dixwaze ku wan bi tenê bihêle. Piştî ew dertê, careke din deng li pîrkê dike;" guhê xwe xweşik bide min, divê tu zaroyekî di zikê min de bibînî.

- Keça min, eger Xwedê neda, ezê ji ku bibînim. Lê gava pença zêran di dawa xwe de dibîne, bi devkenî dibêje: "gotina xatûnê li erdê namîne". Bes tiwê çawa ji Memo veşîrî, ew ne hefteyek û didu ne, divê tu neh mehan, her roj û hino hino, zikê xwe biwermînî. Eger rojekê ew bixwaze bi te re raze, derewa me dê tazî bimîne.

- Tu xeman di vî alî de nexe. Ez karim bihêlim ku ew neh mehan nêzîkî min nebe. Bes tiştê ji te tê xwastin ew e ku, tu bi riya xwe wî agahdar bikî ku ez bi du cana me.

Sînem ji wê rojê de, hino hino, zikê xwe mezin dike. Roj bi roj paçikên nuh li dor nava xwe û dilê Memo digêrîne. Ew di civatên gund de rûdinişt û bi serbilindî digot: "Eger mirov hêviya xwe di Xwedê ke, wê ne poşman be, va ye piştî deh salan bi riwê me ve nerî".

Neh meh kêm çend roj diborin, zikê Sînemê digehe ber devê wê û di rojekê ji rojên dawî de, deng li Hemik dike û wî dikşîne odê.

- Çend rojên min man, de mêr be û bipirse; ka li kû

derê zaroyekî nuh bi dinê ketî. Ji berî ew verêbe, Sînem çend zêran dixîne destên wî.

Piştî sê rojan ji windabûna H. Reşo, ew bi hewşê dikeve û, dûr-dûr, dora oda Sînemê temaşê dike. Gava nas dike ku ew bi tena xwe mayî, bi lez û devkenî, di pêş wê de radiweste.

- Pîroz be, xatûn, keçikeke te çê bû. Gotina "keçik" hi-nekî dilê wê sar dike, lê pêre-pêra germahiya hêviyan di damarên wê re diherike û dibêje xwe; "ji tunebûnê çêtir e".

- Kanî li kû derê ye. Ev keysa me ye. Ji berî ku Memo ji bajêr vedigere, gereke ew bû be.

- Belê, xanim, îşev gereke ew bi dinê keve û ji nuha ve xwe têxîn nav nivînan. Di nîvê şevê de "keçika te" digel pîrka Fat dê li ber seriyê te bin. Piştî gotinê ew mîna marekî ji odê dikşe.

Di berbangê de, û li ser dengê mele, dengê lîlandin û giriyê zaroyekê, ji oda Sînemê bi ser gund de dibare.

- Zînê.. Zînê ez bi qurban. Gundîno, ez bi qurbana we bim... Ez gil-gûyê we dixum, keça min ji min re bînin.

Careke din ew bê hiş dikeve û çend pîrekên ku, li ber seriyê Sînemê rûnştibûn şerpeze mabûn; ne dizanîn bi giriyê wê re bigrîn an jî nifir û henekên xwe pê bikin.

Çend meh di ser bûyerê re diborîn. Zînê, keça heft salî, ro ji royê dihele, ji bilî girî û xwasteka çûna ba

"diya" xwe tutiştê din nizane. Çiqas bav û dê dixwastin bi wê bidin naskirin ku Sînemê ew diziye û dê-bavên wê ew in, lê gotinên wan bê sûde bûn.

Sînemê jî ji aliyê xwe ve, pir şandek û berger ji wan re bi rê kirin da ku Zînê jê re bişînin. Ji bona vê yekê jî, ew çî bixwazin wê ji wan re pêk bîne, lê şandek dest vala lê vedigerîn.

Piştî sê mehan ji wê bûyerê, û di sibeyeke buharê de, gava şîn û girî nayê bala mirov, gundê şiyê bi ser giriyekî şîn vedibe; goristana gund goreke zarokan hembêz dike.

Cindirês - 1999

Serhildana Tutûn

- Hevalê Azad rexneke min li te heye. Dema kar gihişte movika rexna. Xemgîn li Azad nerî û got: Çavên Xemgîn dibrûsin, mîna yên roviya, Azad bilez kar û liva heyvekê, di serê xwe de gerand, lê tutişt nedît ku yek karibe rexnekê lê bike.

Hevalên di civînê de rûniştî tev sekinîn. Bala xwe dane Xemgîn, û her yek di serê xwe de digerîne, "Ka wê çi rexnê li xwe û hevalên xwe bike".

- Bêje hevalê Xemgîn. Azad got.

- Dema hevalê berpirsiyar, li ser rewşa cîhanê di peyivî...

- Ê... Çi bû. Berpirsiyar xwe negirt û xwest bilez rexna Xemgîn bibhîze.

- Wê demê hevalê Azad çixareyek pêxist, lê yek neda min. Piçekî me xwe girt, lê pêre firqînî bi tevan ket. Çav tijî hêsin.

Berpirsiyarê komîtê xwe girt, û bi nerîneke tijî lome û olî li Xemgîn ve gerand.

- Divê hevalê Xemgîn bê rexnekirin, û ne bes wilo, divê em biryarekê pê hildine komîta jor. Ji ber ku rûmeta movika rexna negirt, û ji xwere kir lîstik. Hevalên rûniştî, di cî de ponijîn, serî hejandin û gotin.

- Raste...!!!

Xemgîn li henekiya xwe poşman bû, lê piştî çî.. Dev ji hev vekir bo ji ser xwe bişo. Azad pêşiya wî birî û got:

- Gotina hevalê berpirsiyar di cî deye. Mixabin piraniya hevalan movika rexna ji xwere kirine henek, û divê hevalên jor li ser rawestin, bendekî ji hevalên wilo re deynin. Xwîna Misto ji van sixêfan kelî, rabû ser çonga, û tiliya xwe di ser Azad re hejand.

- Nuha tu bi tena xwe bê kêmasî mayî û dixwazî ku partî benda ji mere deyne. Ji zû de giz-giz, di nav wan de mabû. Ma çî çêbû.. wêranket bi henekiya hevlekî re.

- Çê nabe heval... ev tişt wê ziyaneke mezin bighîne karê me, em nehatine henekan ji hev re bêjin. Hevlekî li Misto vegerand.

- Çi çênabe heval, ma kevir ji mizgeftê de ket. Hevlekî li wî vegerand. Berpirsiyarê komîtê kuxî boriya gewrîyê ji belxemê paqijkir, carekê - didwan simbêlên xwe tevdan. Bi ser xwe de ponijî ku çareyekê ji vê ser êşiya giran re bibîne, dawiya dawî got:

- Hevalno... guhên xwe bidin min. Tiştê dibînim, em bûn du par; hevalên bi rexna çixarê re û yê ne pêre, û ev bû katek, em pê di axifin. Mixabin, me tu çare jê re nedît, lewra dibêjim; Em biriyarekê hildin komîta jor,

bila ew çareyekê ji vê bûyerê re daxin û emê zanibin kî rastbû û kî li ser şaşiyê bû.

Hundir ferehbû, bîn li me derket, kulemist, nerînên tûj û bi awirên gerim ji ezmanê hundir daketin. Berpirsiyar ji min xwest, ku pêûsê têxim dest xwe û raporta jorîn binivîsim.

Raport rabû jor... jor, pelê ku raport li ser hatî nivîsandin di destan de zer dibe, kenarên pel diçirin, tîp û xêz nema tên xwendin. Ez pir serê we ne êşînim, ev raporta me gihîşt encûmena navçeya partiyê, lê mixabin wan jî tu çare lê nedît, rabûn bang li kongirekî giştî kirin.

Kongir rûnişt, me herdu heval, Azad û Xemgîn şandin rênîştinê ji bo ku sibe nebêjin: we mafê me xwar û negerin nebêjin "dîmoqrâtî" di partî de tinebû, "Sal difirin, heyv dibezin, roj dimeşin".

Rûniştina kongir dirêj kir, heval li ser sêla sor hildipekin, yên bi çixarê re û yên dijî wê.

Heyvek dudu çûn û heval xuya nebûn, piştî sed û bîst û sê rojan hevalekî xwe gîhande min.

- Pîroz be heval. Gote min, piştî ku xwe bi min da nasîn nîşana partî danî ber min da ku karibim bi serbestî bi axifim.

- Çi pîrozbe heval ?!

- Kongir û nehcê hevalên me. Bi dil germî got; tîna got-

inên wî niçilkê guhên min reswand. Belê hevalê delal..
nehcê rast, tim û tim wê biserkeve û roja îro..., Gotina
xwe negihand serî ji ber ku deng ji derî tê û divê biner-
im kiye.

- Silavên germ, hevalê delal. Berpirsiyarê komîta
meye, dest dirêj kir, lê dema çav bi hevalê hundir ket ez
himbêzkirim û ji min xwest, em herin xaniyê din.

- Çima ev li ba te ye. Bi zirtî gote min.

- Ew jî hevale û nîşana partî da xuyanî û em dizanin...

- Belê ev tişt me gotibû, lê roja îro nema em ji kesên
mîna wî re dibêjin heval.

- Ew ji partî hatî bi dûrxistin?

- Na... na partiya me û wî ne yeke. Di cî de dest da ser
dêv, weku bê hemdî wî gotin jê hate der. Çima wî tişt ji
tere negotiye:

- Min tişt fêhm nekir, nizanim li ser kongir û "nehic" di
axifî, dema te li derî da.

- Him... m, ji tere negot nehçê me di kongir de bi ser
ket, û yê din çend kesbûn û qetiyên.

Berpirsiyar bi sixêfî gotina davêje û xwest hîn pêde
here, lê vebûna derî û xwesteka wî hevalî, ku em hersê
bi hev re rûnin, hiştin berpirsiyar peyva xwe bi bire.

Bayê hundir, di cî de bi dijîtiya wan qijilî. Lêvên le-
rizînok silavek zer li hev kirin.

Dem bû lîstikê zarokan, ji hev kişiya, dirêj bû. Min